HEVDEM

DI NAV BERA KELTUR Û MEDENÎYETÊ

Evîn Tahir Hirorî

Civakê me ji aliyekêve pabende bi kumeka dab û nerîtên eşayirî ve û ji alîyekê dî ve daxwaza medenîbûnê dike, Medenîbûn wate gihurîna hindek dab û nerîtên kevin û cêgêr kirina yasayê û dahînana hizirên nû ku xizmeta gehiştina gelek armancên vê qunaxê weku dîmukirasiyet û mafê mirovî bike û vê çendê jî pêdivî bi gelek binemayan heye, weku danana jêrxana aborî ya bi hêz, zêdeb[na rêja xandinê û pêşveçûna zanistê û dezgehên medenî diwarê avakirina deronê mirovî de. Her çend e em yê daxwaza avakirina civakê medenî dikin, lê dirastî de em yê berovajî medeniyetê birêve dicing. anku yên dinavbera keltur û medeniyetê de berze buyîn û merema min li vêrê hemû takên civakî nînin, jiber ku texeka civakê me nizanin civakê medenî çî ye û dê mînne li wêrê texa rewşenbîran ku mêxabin ew jî kesên duserî ne û bi tinê divên xwe bi rewşenbîr bidin niyasîn û naverûka wanjî berûvajî vê çendê ye, jiber ku yên fêr buyîn tiştên ciwan bê-

jin, lê di piraktîk de pêgîryê pê nakin û jiyana wan ya di nava xêzanê û derve de gelek ya jêk ciyawaze, jiber ku liser vî şêwazî yên perwerde buyîn û ew bixwe jî bi tinê giringiyê bi serveya xwe didin û pûte bi avakirina naveroka xwe nadin û gelekin ew kesên bi tinê ji ber axiftinê bo xwe behayek peyda kirî û ne bi tinê kes, belku partên sîyasî jî gelek dirûşmên çaksaziyê bilind dikin bê ku bicih bînin û ya bûye nerîtekê zor yê siruştî ku ew tiştê mirov dibêje wî bixwe bawerî pê nebe û bicih neyne, lewra ew kesê bi rewşenbîriyê dixurît, demê dikevte diwarê piraktîkî de gotin û kirîyarên wî di hevdijin, bo nimune dê ciwantirîn peyva diwarê perwerdekirina zarokî de bêjit, lê yê berheve bo qutana zarokî yan dê bi gotin pištevanê mafê afretê be, lê bi kiriyar yê berheve (4 , 3) jina bînit lewra jî çêkirina civakê medenî ne ya bi sanahiye û divêt ew tiştê em dibêjin li berahiyê me bixwe bawerî pê hebit û peyrew bikin û bizanîn xalên nêgetîvên dinava kelturê mede û yên pozetîvên dinava kelturê civakê medenî de çine, ku van xala bigehînin êk û kelturekê çêkin ku digel vê serdemî bigunce. divêt me bawerî bi gihurînê hebe, eger dapîra min mafê dengdanê nebûye, lê evro ne bi tinê min mafê dengdanê yê hey, belke ez dişêm xwe helbjêrim jî, eger dapîra min nexwandevan bûye, lê ya fere ez evro kêmtir ji xwandina bala pesend nekim û.... Hitid. ya diyar e ku dinavbera du cîla da gelek gihorîn çêbuyîne, jiber ku bi hîç rengekê nûxwazî û kelturparêzî digel êk naguncin, evca nabe ew tiştên di serê deyik û babande li ser zaroyên wan bihête sepandin, bila bihêlin ew bixwe jî serederiyê digel gihurîn û di8 gel gukorîn û nûyatyên jîyanê bikin. Evroke di nava welatê me de gelek tiştên heyin ku pêdivî bi guhorînê ne û divêt em bixwe bi destê xwe biguhorîn, kes nahê bêje we çi dive.